
# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Gulan / 1 - 5 - 2022 | Kurdistan-Hejmar (220) | www.pdk-s.com


# Tevgera Ciwanên PYD di kiryarên xwe û revandina zarokan de berdewam e

Kurdistan


الولد الثاني

الرقم الوطني: [illegible]

الجنس: انثى

الاسم: جوليا

النسبة: ددو

اسم الأب: طارق

اسم الأم ونسبتها: عليا جعفر

محل وتاريخ الولادة (رقما وكتابة): حلب ١/٥/٢٠٠٩ الفان وتسعة

رقم الواقعة: ٥٩٥٠

تاريخ القيد: ٤-٢-٢٠٠٩

الواقعات الطارئة:



Endamên Ciwanên Şoreşger keçeke zarok a bi navê Cûlya Tariq Dedu li pêş dibistana Berae Bin Malîk a li taxa Şêx Meqsûda Helebê revandin. Cûlya Tariq Dedu temenê wê 13 salî ye, bavê wê li jiyanê nemaye, ew ji gundê Maratê ya Efrînê ye û li gel malbata xwe koçberî Helebê bûye. Herwiha çekdarên PYD xalê wê keçê jî revandin piştî ku daxwaza vegerandian Cûlya kiribû. Tevgera Ciwanên Şoreşgera ser bi PYD û PKK ve ye û pêştir çendîn caran ciwanên Kurd revandibûn û biçek kiribûn. Kiryarên vê tevgerê jî rastî gelek nerazîbûna xelkê Rojavayê Kurdistanê. Tevî ku HSD di Hezîrana 2019an de bi Neteweyên Yekbûyî re planek ji bo bidawîkirin û qedexekirina leşkerkirina zarokan îmze kiribû.

Lê ji dema ku peyman hatiye îmzekirin ve, rewşa revandina zarokan bi dawî nebûye û halet jî zêde bûne. Çalakvan Mistefa Şêxo ji Rojnameya Kurdistan re ragehand, PYD û grûpên ser bi wê ve dixwazin bi van kiryaran xelk zêdetir koçber bibin, û êdî Kurd li deverên me nemînin. Merivekî wê keçê jî ji Rojnameya Kurdistan re got, ew newêrin daxwaza keça xwe bikin, rewşa wan gelekî xerab e û ji tirsa newêrin derkevin û gef li wan tê xwarin, em dixwazin hemû alî bi hewara me ve werin.

# Armanckirina ofîsên ENKS tawan e û divê êrîşkar werin sizadan


Kurdistan- Hozan Ebdula

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) daxwazê ji Amerîka dike, sînorekê ji binpêkirinên PYDê li Kurdistana Sûriyê deyne. Di çend rojên borî de 9 ofîsên Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKSê û partiyên di nava wê de hatibûn şewitandin, di wê derbarê de Sekreteriya Giştî ya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKSê di daxuyaniyekê de ragihand, “PYD û dezgehên wê yên ewlekariyê, bi riya êrîşkirina li ser ENKSê û şewitandina ofîsên wê, sivikatîkirina bi al û sembolên Kurdistanê, birêkxistina meşên di bin sembol û diruşmên PKKê de, revandina zarokan û gefxwarina li malbatên Pêşmergeyên Roj, rewşeke girjî û tirsandinê di nava xelkê zêde dike.” Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS diyar kir ku armanca Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê ji van êrîşan ew e “kedên Amerîka yên ji bo amadekirina zemîneke erênî ji bo nehîştina astengiyên li pêş danûstandinên Kurdî dide, têk bide, herwiha ji bo bidawîkirina jiyana siyasî û veşartina têkçûnên wê ye.” Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS di vê derbarê de dibêje: “Em bang li Hevpeymaniya Navdewletî û bi taybet Amerîka dikin ji ber li herêmê ye, pêwendiyên wê bi HSDê re hene û serperiştiya danûstandinên Kurdî dike, rêkarên pêwîst bigire û helwesteke cidî li hember kesên li pişt van êrîşan bigire û wan ceza bike.”

Ofîsên hatine şewtandin ev in:
182022-4- ofîsa Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S li bajarê Dirbêsiyê.
182022-4- ofîsa Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS li bajarê Dêrikê.
192022-4- ofîsa Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S li bajarê Hesekê
192022-4- careke din êrîşî ofîsa Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya PDK-S li bajarê Dirbêsiyê hate kirin.
202022-4- ofîsa Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS li bajarê Kobanê.
202022-4- ofîsa Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S li bajarê Kobanê.
202022-4- ofîsa Partiya Yekîtiya Kurdistan- Sûriya li bajarê Kobanê.
212022-4- ofîsa Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS li bajarokê Tiltemirê.
212022-4- ofîsa Partiya Gel a Kurdistan-Sûriya li bajarê Kobanê.
224- ofîsa Partiya Yekîtiya Demokrata Kurdistan-Sûriya.
222022-4- nivîsandina diruşmên xeran li ser dergeh û dîwarên ofîsa rojhilatê Qamişlo ya Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya PDK-S.

Li ser vê mijarê ku berdewam ev binpêkirinê derheqê Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKSê têne kirin, rojnameya Kurdistan nerîna hejmareke welatiyan wergirtiye. Welatiyek dibêje, pêwîst e ENKS helwesteke cidî werbigre û xwe ji danûstandinên ligel Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD vekşîne, û bi merc des bi danûstandinan bike, heger bi vî awayî derbas bibe ENKS dê xwe sivik bike û qîmeta xwe di nava cemawerên xwe de nahêle, nabe ENKS xwe ji PYD û hêzên çekdar yên ser bi wê ve biçemîne, ji ber xweçemandin dibe sedem ku zêdetir ev rêxistin binpêkirinan encam bide û tecrubeyeke dûdirêj ya vê partiyê di binpêkirin û kiryaran de heye, lewma ya giring ew e helwesta ENKS tund be, û li gor asta binpêkirinan be.Welatiyekî din jî wiha li ser vê mijarê dibêje, danûstandinên Kurdî Kurdî ne ji niha de ji zû ve bidawî hatine, ji ber aliyên gerantîkar pabendî rêkeftinan nabin û Mezlûm Ebdê beşek ji têkçûna rewşa ewlekariyê û êrîşên ser baregehên ENKS ji berk u ew dikare van êrîşan rawestîne, lê diyar e bi devê wî ev êrîş têne kirin û ew berpirs e, herwiha divê ENKS bi cidî daxwazê ji Emerîka bike heta ku ev kiryar werin rawetandin, û sînorekî ji kiryarên vê rêxistinê re deyne ji be rev kiryar ji sînorên xwe derketine.





# PYD û hêzên ser bi wê ve di binpêkirinên beramber rojnamevanan berdewam in

Kurdistan

Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistan-Sûriya, bi boneya Roja Rojnamegeriya Kurdî peyamek belav kir û tê de daxwaz kir, "çapemeniya Kurdî û xebatkarên wê ji dijminatîyên partîtî bên dûrxistin û bi azadî û bê tirs kar bikin." Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistan-Sûriya peyama xwe de ragihand, " salvegera sed û bîst û çaremîn a weşana rojnameya Kurdistan derbas dibe ku ji aliyê rojnamevanê Kurd Mîr Miqdad Midhet Bedirxan ve bi jêhatî hat birêvebirin, tevî derketina astengî û zehmetiyên li pêşiya rojnameya "Kurdistan" û xwediyê wê, lê ew di dirêjahiya dîroka çapameniya Kurd de xalek ronak dimîne." Di peyamê de hat gotin, "Rojnamegerên Sûriyê ji dema ku partiya Beis hatiye ser desthilatê ve, di karê xwe de rastî pirsgirêkên mezin hatin ku heta niha rojnamevanê Sûrî yê ku li derveyî bazneya rejîmê bifikire, her tim li ser asta rûmet û jiyana xwe tê armanckirin." Sandîkaya Rojnamevanên Kurdistan-Sûriya dibêje: "Ji Dema ku Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) rêveberiya herêma Kurdî ji rejîma Sûriyê wergirtiye, kiryarên vê partiyê yên derbarê sînordarkirina karê medyayê bi giştî de, bi ser ya rêjîmê ket." Sendîkaya Rojnamevanan di beşeke din a peyama xwe de ragihand: "Sazî û dezgehên PYDê tundûtûjiya birêxistinkirî li dijî her rojnamevanekî ku ne bi bîr û baweriya wê re be pêk aniye, hin rojnamevan girtin û tiliyên wan şikandin û hin rojnamevanên din jî sirgûnî derveyî sînor kirin." Herwiha got: "Medyaya PYDê bi rêya çekên xwe yên ragihandinê jehra dubendî û nefretê belav dike, fitneyê di nav welatiyan de derdixe, û rojane binpêkirinan li dijî kesên ku ne bi wê re ne pêk tîne. Her wiha roleke neyînî di şerpezekirina yekrêziya Kurdî de dilîze, bi taybetî di van demên dawî de bi qestî êrişî Hikûmeta Herêma Kurdistanê û sembolên Kurdistanî dike." Di beşeke din a peyamê de hat gotin: "Em di Sandîkaya Rojnamevanên Kurdistanê – Sûriyê de, daxwaz dikin ku çapemenîya Kurdî û xebatkarên wê ji dijminatîyên partîtî bên dûrxistin û bi azadî û bê tirs kar bikin û ji bo rojnamevanên Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê jîyanek bi rûmet dixwazin." Di vê dema dawî de, Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD û hêzên ser bi wê ve hejmarek rojnamevan girtibûn û ew rastî astengiyan hatibûn, û vê yekê jî karvedanên mezin li pey xwe ve anî. Rojnamevanek dibêje, Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD ji dema ku rejîma Esed desthilat radestî wê kir, û wê dest bi binpêkirinan kiriye, niha li Kurdistana Sûriyê PYD bi dare zorê hemû ragihandin xistiye jêr destê xwe de, û nahêle tik es jibilî hizra wê nûçeyan belav bike, tiştekî din ku balkêşe ew peyamnêrên ajans û kenalên Erebî jî di jêr kontrola wan de ne û bergiriyê li wan dikin, bi vê pêngavê medyaya cîhanî jî bi aliyê xwe ve aniye, û ewê ji derveyî nerîna wê kar bike dê moletê ji wan werbigre, wek nimûne girtina herdu kenalên Kurdistan24 û Rudaw. Rojnamevanek ji Rojnameya Kurdistan re eşkere dike, pirsa dana moletê jî bi hesanî nayê dan, heger ew kes ji wan re kar neke molet pê nayê dan û gelek caran mercên wan li ser dezgehan hene heta ku moletê bidne wan, û ev yek jî bi xwe binpêkirine li dijî mafên rojnamevanan û karê rojnamegeriyê.

# Roja Rojnamegeriya Kurdî rojeke pîroz e


Kurdistan

Roja Rojnamegeriya Kurdî, roja bîranîna derketina yekemîn rojnameya kurdî ye. Rojnameya Kurdistan di 22ê nîsana 1898an de ji aliyê Miqdad Midhed Bedirxan ve li paytexta Misrê Qahîreyê hate çapkirin. Bi helkefta vê cejnêla dîrokî, 22ê nîsanê weke Roja Rojnamegeriya Kurdî tê pîrozkirin.
5 hejmarên pêşîn ên yrojnameyê di şert û mercên dijwar de li Qahîreya paytexta Misrê hatin derxistin, lê piştî zext û zordariyên dewleta Osmaniyan hêjmarên wê yên 631-an ji aliyê Ebdurrehman Bedirxan ve li Swîsreyê û Înglistanê hatin derxistin.
Rojnama Kurdistan bandoreke mezin li ser rewşenbîriya Kurdî, tevgerên Kurdan û hişyarkirina neteweyî bi giştî kiriye. Di 124 salên bihorî de bi hezaran rojname û rojnamevanên Kurd li ser rêbaza Miqdad Midhed û Ebdurehman Bedirxan de meşiyane û li gel hemû zext, zoriyan vê mîrata wan roj bi roj pêşve dibin.
Mixabin heya îro jî salane bi sedan rojnamevan û nivîskarên kurd yên hemû beşên Kurdistanê ji ber xebata xwe ya pîşeyî û derbirîna raya xwe dikevin ber êrîşên narewa, wek niha çawa li Kurdustana Sûriyê rojnamevan rastî astengiyan tên.



# Birader : Li bin Alaya rengîn azadiya min e

Hevpeyvîn:
Mahir Hesen



Guhdarîkirina dengê wî Mirov dilxweş dike, û wisa di xeyelên dûr û kûr de diçe. Ji Piçûkanî hestên xwe bi rêkûpêk kirine, heya ku bandorek erênî li her nifşî kir. li ser rewiştê, û rêwîtiyê, niştîman, hw... strandiye. Berî em Derbasî hevpeyvînê bibin, em ê li Dîroka Muzîk ê vegerin, ku bi gelek ramanan hatiye vejandin, ji Pythagoras dest pê dike, ku tê gotin ku destpêka wî bi matematîkê re bi muzîkê buye, her wisa jî ku feylesûf Platon muzîk bi zagonek ehlaqî destnîşan kiriye û girîngî pir pê da ye. Divê li vir jî em zelal bikin ku muzîk ji gelê Alman re rolek taybetî lîstiye, û Karl Marx jê re digot "Bêbextiya Almanan" Ewqs. Ji ber vê yekê jî Muzîka kurdan bi qasî xemgînî, tirs û şahiyê bihêz e, û ji lewma berhema Hunermand Hozan Birader wek xebatê tê dîtin. Di vê hevpeyvîn ê de em ê wî ji nêzîk ve bi nasînin.

*Tu dikarî zêdetir li ser jiyana xwe ji me re bibêjî? Ez sala 1958 li gundê Mûsika ku niha bûye tarek bajarê Mêrdînê,hatime dinyayê. Bavê min dengbêjekî mihelî bû.Em 5 bira û du xuşk bûn.Ez di malek feqîr û xizan de mezin bûm. Perwerde û evîna min ya stranbêjîye li civata bavê min destpêkir. Emrê min 89- sal bûm bi xwe çûm dibistanê.Di dema dibistanê de fêrî tembûrê,mandolînê û bilûrê bûm.Ji 14 e salîya xwe de min xwe fêrî tembûr û stranan kir û hêdî hêdî xwe di vî warî de pêş xist. Piştî ku li bajarê Wanê jiber stranên xwe ketim zindanê min biryarda kû strana Kurdî ji xwe re bikim armanc. Min koleja tanduristî heta sala çaran xwend lê naçar mam û min dest jê berda. Ji sala 1986 de li Holanda jiyan dikim.Li gel karê muzîkê şano,sinema û şêwekarî dikim.

*Te ji kengî ve dest bi stranbêjiyê kiriye û kesên ku herî zêde piştgiriya te kirine kî ne? weka ku min li jor jî got piştî zindanê sala 1976 min bi zanebûn dest avêt karê strana Kurdî.Lê berîya wê jî min stran digot.

*Rêyek Hozan Birader ya taybetî heye ku ji hunermendên din cuda dike, ji ber vê yekê sedem çi ye ku te şêwaza xwe bi rengekî taybet digire? Herkes rêyek û rengekî xwe taybet haye.Ev jî li ser karekter,fikr û raman û rengê jiyanê ava dibe.

*Bi dîtina te nifşê nû wê çanda xwe û bi taybetî jî Kurdên li dîasporayê biparêze? Ne xasim piştî derketina hunera rapê di nav kurdan de, ku pirraniya xelkê me lê dinerin ku tu têkiliya wê bi hunera kurdî re nîne. B-Dunya gılobal û dema teknolojî çand û kultur û muzika milatan pir npzîkî hev kirîye.Car caran tevlîhev jî dike.Em Kurd jî li vê serdemê dijîn û di binê vê bandorê de ne.Ya girîng em sûdê jê wergirin.

*Bandora kesên Beyanî li ser te hebûn, ango li ser hunera te? Cinku ev demek dûrûdirêje ku tu li Ewropa dijî Di vê bersîvê de nikarim navekî taybet bêjim lê ,min demekê li dibistana bajar diroka muzika clasik ya awrupî xwend.Di vê navberêde Berhemên clasik guhdarî kir.Dûra ji xwe min li hunermendên wek Jimi Hendriks,Barî Wite,Eric Klapton,Joe Cocker,Dog Face Harman û The Ex guhdarî dikir. Salên 90 de min li gel Dog Face Harman û The Ex me li Almanya,Belçîka û Holanda turn konsert li darxistin. Ji min re hemî bûne feyde.Lê tu carî min nexwest ji bêndera muzika Kurdî bi dur bikevim.

*Hez deng û dilxwazê hunera te li Rojavayê Kurdistanê hene, dibe ku di pêşerojê de konserekê li kurdistana Sûrî lidarxî? Belê ew daxwaza mine rojekê li Kurdistan Rojava li binê Ala rengîn konser bidim.

*Gelo cudahî di navbera peyama siyasetmedar û peyama hunermend de heye, wekî ku me di dema dawî de peydabûna çend hunermendan di qada siyasetê de dît? Siyasetmedar girêdayî partî û rêxistinane.Ligor sînor û destûra partîyên xwe tevdigerin. Siyaseta ku hunermend pê mijûle gereke di ser parti û rêxistinanre be.Hunera Kurdî bi xwe xizmeta siyasetêjî kirîye û dike. Peyamên hunermendan gere sinor û tuzukên partî û rêxistinande nemînin.Bêtir bi azadî peyamên xwe bidin.Ew hunermendên ku daketin qada siyasetê xwestin di warê yekrêzî û aştî de gavan bavêjin lê bi ser neketin.Min ji wan re goti bû:Bi vî rengî û bi van peyamên yek alî şansê we yê serkeftinê kême.Berîya hemi tiştî ala rengîn hildin destê xwe bo bawerî çêbibr da hûn di ser partîyanre tevdigerin

*Bajarê ku te herî zêde bêriya wî kiriye û tu dixwazî di zûtirîn dem de biçî serdana wî bike çi bajare û çi wateya wî ye ji bo te ? Jibo Hunermendekî ku bi salaye ji welatê xwe dûre,pirsek gelek zahmete.Ez li Mêrdînê hatime dinyayê.Zaroktîya min li Mêrdînê derbas bû ye.Bêrîya zaroktîya xwe dikim.Li bajarê Wanê xortanîya min derbas bû ye.Bêrîya wê demê dikim. Wan bajarê dilê min e. Bêrîya Hewlerê dikim. Azadîya min li wir heye. Hewler fexra min e.Li bin Alaya rengîn azadîya min e.

*Te bi hêz piştgiriya Refrandoma Başûrê welat kir, bi nerîna te dema dewletbûnê derbas buye weku gelek li ser ragihandina dixwazin vê yekê bigihînin miletê me? Raste ev gotin bi taybet li Kurdistana Bakur tête belav kirin. Ev gotin jibo kû fikra dewletbûnê ji serê Kurda paqijkin dibêjin.Dema dunya hêdî hêdî avadibû û cudahî di navbera insan û heywanan de destpêkir;nîşanên xwe organîze kirine û idarekirinê jî xûya bûn. Her kû serdeman reng guhertin,rengê îdareya civatan pê serdeman re hate guherdin.Rengê îdarekirina herî dawî navê wê dewlete.Heta roja qiyametê jî wê dewlet hebin. Em Kurd jî mîna her milletî gereke dewleta xwe ava bikin.

*Gotinek ji bo nifşê nû Bixwînin û li ziman û çanda xwe xwedî derkevin Xwe kêmî kesekî nebînin.Çi yê Tirk û Arab û Acem û Alman û Ingilizan heye,bila yê we jî hebe.Bi xwe bawer bin.Ji hev hez bikin. Sipasîya we û xwendevanan dikim.